BROTTSOFFER JOUREN 0200-212019

Centrala telefona Navenda Sûczedeyan
Federasyona Navenda Sûczedeyan

Box 110 14
100 61 Stockholm
Telefon 0200-21 20 19
Alîkarîya ziman: 08-642 00 44
telefoncentralen@boj.se
www.boj.se

Ne asan e ku meriv bibe hedefa sûczedeyîyê.
Herwekî ku meriv têkeve bîreke tarî.
Wê çaxê jî pêwîstî bi destekî alîkarîyê heye.

Telefon bike: 0200-21 20 19
An jî ji vir zêdetir bixwîne: www.boj.se

BOJ
BROTTSOFFERJOURERNAS
RIKSFÖRBUND

ALÎKARÎYA NAVENDA SÛCZEDEYAN BELAŞ E

Federasiyona Navenda Sûczedeyan rêxistineke îdeal e ku alîkarîya wan kesên sûczede dike. Li tevayîyê welêt ji 100î zêdetirî Navendên Sûczedeyên lokalî hene. Li wir kesên xwedî zanebûn û tecrûbe hene ku alîkarîya wan kesên sûczede dikin, kesên ku bûne hedefa vê yekê. Li wir ew ê guhdarîya te bikin, şêwir û şîretan bidin te û ew ê agahîyê bidin te ku te çi heq û hikûq heye. Tu dikanî li ser doz û rêya wê agahîyê werbigirî. Ku tu têkevî derîyê mahkemeyekê ne pêwîst e ku tu bi tenê biçî û xwe bi tenê hîs bikî.

Alîkarîya me belaş e. Û tiştê ku tu ê ji me re bibêjî, em ji kesekî din re nabêjin. Hemû kesên ku li ba me kar dikin sondxwarî ne ku ji kesekî din re nebêjin.

Em ne dezgeheke dewletî ne. Girêdaneke me û siyasetê an jî dînî tuneye. Navenda Sûczedeyan toreke alîkarîyê ye ku li ser bingehê rêxistina Mafê Merivî ya FNê kar dike.

Navenda Sûczedeyan her sal alîkarîya zêdetirî 40 000 kesan dike ku ew raserî, şêlandin, dizî, lêdan, gef, heqaret, piçûkxistin û destdirêjiyên seksuelî an jî tecawizî bûne.

JI BILÎ SWÊDÎ EM BI ZIMANÊN DIN JÎ DIPEYIVIN

Federasyona Navenda Sûczedeyan Centraleke xwe a telefonê heye ku tu dikanî telefonê wir bikî û pirsan jê bikî, agahîyê jê werbigirî an jî di Navenda Sûczedeyên herêma xwe de pêwendîyê bi yekî wir re daynî ku hûn hevdu bibînin.

Di rêya Centrala telefonê re te îmkan heye ku tu li wir pêwendîyê bi yekî re daynî ku ew bi zimanê îngilîzî, îspanî, fransî, rûsî, farisî, erebî, soranî, sirbî an jî macarî dizane.
Me hêvî heye ku di rojên pêş de em alîkarîyê bi zimanên zêdetir bikin.

Ku zimanê te ne yek ji van zimanên jorîn be jî, carina yekî ku bi zimanê te bipeyive li Navenda Sûczedeyên herêmeke Swêdê peyda dibe. Bila şik û guman li te çênebe û pêwendiyê bi me re dayne – em ê bikin ku problema zimên hal bibe.

BI ZIMANÊ XWE TU Ê WEHA PÊWENDIYÊ LI GEL ME ÇÊKÎ

Ji bo ku tu alîkarîyê bi zimanê îspanî, fransî, rûsî, farisî, erebî, soranî, sirbî an jî macarî bixwazî, telefonî: 08-642 00 44 bike û di auto-telê de agahî bi zimanê cuda cuda heye. Mesaja xwe têde dayne û bibêje bê tu dixwazî bi kîjan zimanê pêwendî bi te re bibe. An jî telefonî 0200-21 20 19 bike û rasterast bi swêdî an jî îngilîzî li gel yekî bipeyive.

Tu dikanî weha jî bikî, e-postekî bişînî kontakt@boj.se ku pêwendîyê bi te re daynin. Wê çaxê tu ê daxwaza zimanekî ji van heft zimanan bikî ku me îmkan hene (ji bilî swêdî û îngilîzî) îspanî, fransî, rûsî, farisî, erebî, soranî, sirbî an jî macarî.

KEREM BIKE TU JÎ JI DILÊ XWE LI BA ME BIBE ALÎKAR

Me pêwîstî bi kesina heye ku bi rêya telefonê û carina jî bi e-posteyan alîkarîya me û zimanên cuda cuda bike ku em jî bikanin alîkarîya hinekan bikin. Ku te wext hebe û ji dilê xwe bexşî vê yekê bikî, pêwendîyê li gel Centrala telefonê dayne û bibêje. Alîkarîya te îdeal e û tu ê tu pereyekî wernegirê. Lê tu ê perwerdeya xwe li ba me bistînî û tev li dostaniyeke germ û xweş bibî. Û tu ê ji sûczedeyekî re bibî alîkar ku ew bi zimanê te dipeyive.

Li ser Navenda Sûczedeyan agahîyeke zêdetir bi zimanê swêdî û îngilîzî di vir de heye. www.boj.se

Navenda Sûczedeyan alîkarîya sûczedeyan dike.
Em ne dezgeheke dewletî ne.
Em ji kesekî din re nabêjin.
Alîkarîya me belaş e.